Du pirtûkên Lokman Polatî

Berhevkirin: Gerok



"Gûlîzar" li Stenbolê, di nav weşanên Helwest / Doz de hate weşandin. Pirtûk 112 rûpel e û berga wê gelek xweşik û rengîn e.

"Gûlîzar" ji 12 kurteçîrokên kurdî pêk hatiye. Her kurteçîrokek rengeke ji jiyana civakî ya kurdan radixe ber çavên mirov. Di pirtûkê de, hîcivên sosyal, civakî, rewşên îronî, alegorî û sembolên taybet hene. Firforoka heftreng weke sembola azadî, demokrasî, pirdengî û pirrengiyê hatiye ravekirin.

Di kurteçîrokan de pirsa zewacê, evînê, tenêtiyê û her weha pirsgirêkên nivîskarîyê bi zimanekî edebî ji xwendevanên kurd re hatiye pêşkêş kirin.

Nivîskarê pirtûkê, Lokman Polat van kurteçîrokên xwe bi stîleke nû nivîsîye. Ev kurteçîrokên ku di pirtûka wî ya bi navê "Gûlîzar" de cih girtine, neweke kurteçîrokên wî yên berê ne. Ev modern in û ji yên berê gelek baştir in. Naveroka pirtûkê, zimanê wê, teknîka nivîsê û metoda ravekirina çîrokan bi şêweyeke modern hatine pêkanîn.

"Nûrheyata Licî" ji nav weşanên "Helwest" li Swêde hate weşan. Pirtûk bi heman navî li Stenbol jî hatiye weşan û li welêt hatiye belavkirin.

Polat evîna keça mîrê Etaxê û kurê fermandarê kela Şîro (Kela şîro li navçeya Licê ye) bi şêwyekî edebî afirandiye. Di kurteromanê de welatê bav û pîrên kurdan, an ku welatê Horiyan, rewşa Merwaniyan, şerê Ariyan û Bîzansiyan derbas dibe. Hatina qewmên hacûc û macûcên hov ji Asya navîn û êrîşên wan ên barbarî jî di beşeke kurteramonê de tê vegotin.

Beşa balkêş a kurteromanê fetihkirina bajarê Jarusalemê (Qudis) ji aliyê fermandarê kurd Selehedînê Eyûbî ve ye. Di gel gelek bûyerên dîrokî, sehneyên mîtolojîk û fantastîk jî di kurteromanê de hene. Zimanê pirtûkê hêsan e û macerayên wê herikbar e, xwe bi mirov dide xwendin.